Em îro li vir in, ji bo li dijî şandinê derkevin

Li gor rojnameya Tagesspiegel ya vê salê, 21.000 kes li Berlinê di xetera şandinê de ne. di Sala 2004an de her roj li nêzîkî pênç kesan ji Berlinê dihatin şandin. Yanî radestkirina bi dewletên zilimkar re ku dawiya wê bi lêdan û mirinê te. Şandina mirovan yên ku piranî bi malbatên xwe ve bi salan li vir jiyan dikin, tê wê wateya ku diroka jiyana wan tê hejandin.
Li tevahiya almanya 217.000 mirov bi "Duldungkê" jiyan dikin. Mecbur dibin herdem hesabê xwe yê şandinê bikin. Ev rewşa ne ewle nayê tehmulkirin, dike ku mirov têkeve rewşek bê çare û bê pêşeroj. Tesîra nefsî, ruhî û canî pir giran dibe.
Di encama siyaseta deh slan de ev rewş hate hole ku mirovan mehrumdikin, dûrdikin û rezîldikin. Ev siyaset ji pejirandina civakê tê. Minak: sala 1993an hemû hêzên siyasî li ser pirsgirêka penaberan lihevkirin û mesele anîn dawî. Bi vê lihevkirinê siyaset piştgirtiya nejadperestên derîrîberdayî dike û wan bi xwe ew avakiribûn.
Yekitiya Ewrupa di heman demê de yekitika pratika şandinê ye.
Di pêş de wê gelek mirovan bi bikoman bi teyarên dîrekt ji vir bên derxistin. Ev insiyativa koçberkirina kocmalî ji terefê van dewletan (Fransa, Almanya, Italiya, Ispanya û Ingiltere)hatiye plankirin. 5ê meha tirmehê li Evian (Haute-Savoie) ev biryar stendin, şandinê di dema pêş de bi plan û agahdarî bi hev re bimeşînin.
Di meha yekê de, sala 2004an de EU-Gipfel (civîna serokên dewletên Ewrupa) li Dublin 30 Million Euro ji bo koçberkirina koçmalî ji bo salên 2005 û 2006 dane xidmeta vê proje yê. Ji bo penaber nema karibin lingê xwe deynin Ewropa, dîwarê Ewrupa bi kampên komkirinê tê raxistin. Şandina mirovan yên ku piranî bi malbatên xwe ve bi salan li vir jiyan dikin, tê wê wateya ku dîroka jiyana wan tê tarûmarkirin. Şandin bi xetera jiyanê şiklekî pratîka nijadperestiyê ye, ku gereke em bi qerareke xurt li dij derkevin.

Ji bo dewletên ewrupa û civakên wê bila zelal be: em ne "nekêrhatiyê" vê dewlemendiyê ne, ku herdem wisa xirab tê belavkirin. Zengînbûna van dewletan li ser talankirin û mijandina pişta welatên me ne. Em li vir in , ji ber welatên me ji terefên welatên rojava ve tên talan û mijandin. minak: Joguslawiya berê, Afganistan, Kurdistan, Irak, Kolumbiya, Togo, Kamerun, Îran uhd. Dema bi hezaran penaber bi bêheqî û di bin rewşên xeter de û demên dirêj di girtîgeha şandinê de ne , bi milionan ewrupî li welatên me turistin wedî mafin û azad digerin.
Li Almanya penaberbûna mirovan tê wateyê ku:jiyan di bin qanûnên awarte de ye: wek:

- Qanûnên awarte (qanûna koçberitiyê), qanuna penaberan (iltica)
- Rûniştina herêmî ya teng: azadbûna hereketê, tenê di hundirê heremekê de
- Dilşikestî û hustuxwarî bi „Gutscheinê" xwarinê û 40 Euro perên bêrîkê di mehê de.
- Girtina di kampan de û girtina şandinê
- Vegerandina daweyên qebulkirî yên siyasî ku ji xwe hejmareke kêm e. ((1,6%)

Jiyana kocberan jî di bin tehdîda nijadperesti, tecrit û şubha terorê de tê meşandin.
Ne tenê mahrûmê mafê hilbijartinê ne, lê hemû şiklên karên siyasî ji bo wan qedexe ye û mîna curmekî ye.
Jiyanek morovahî ji bo penaber û koçberan sistematîk tê mahrumkirin. Ji ber ji "şaristaniya rojava" re suretê dujminekî lazime, ji bo wan bike berpirsên pirsgirêkên civakî, kêmasiyên zanistî, curmî û terorê……
Bi vî rengî penaber bûne mijara êrişên kapitalizmê. Pêşî tûndiya xwe li ser wan dimeşînin.
Em ji van kiryarên koloniyalizmê têr bûne û ev rewşa ku nayê tehmûlkirin didomîne.
Ev banga me ne ji bo wijdanê "burjuwaziya demokrat " û hevalbendên wê ye.
Em tenê bi zelalî dibêjin: Mahfê me heye li ser jiyanek mirovahî. Ji bo wê emê herdem û li herderê li berxwe bidin.
Em bangî koçber û penaberan dikin:
Em nahêlin ku em bên perçekirin wek kocber û penaberên "baş" û "xirab".
Tenê bi nêzîkbûnek navnetewî û piştg**Linkspartei (partya çep)/PDS**

WASG û PDS di programên xwe yên ji bo hilbijartinê gotinên mirovahî ji alikî ve bilind dikin, lê di pratikê de xwe dixin qalibê „realpolitikê"de. Lê li cihê hukumdariyê ruyê xwe yê rastî diyar dike. Li gor ku PDS di senatora Berlinê de ye, ew jî hereketên şandinê, „Gutscheina" û Chipkartan, duldunkê û şandin jî bi kar tîne. Ji aliyê alikariya madî, cureyên kampan ve ferq wê û herêmên din li almanya nîne.
Gotinên dijî xerîban ji terefê nûnerê wanî yekem Lafontaine, ne tishtekî vala û bê fikir e.

Nûnerê wan yê ji bo hilbijartinê , Hakki Keskin Lobîistê Tirki, ku penaber hîc mereqa wî nakşînin, ne nîşanek bi xêr e.

SPD û Bündnis 90/Grüne

Heft salên hukmdariya sor û kesk di hundir û derve de sembola tecrîdkirin û nejadperestî û qutbirînkirin û şer e. ev gotinên wek civaka mûltîkultî, intgrasiyon û mafên mirovan, îro jî di bernama hilbijartinê de ye, lê ji derwa pê ve tiştek nîne.
Qanûna nû ya kocbertiyê ji qanûna nejadpestî û plankirinê pêve tiştek nîne. Rewşa nayê tehmûlkirin a jiyanê û şandinê ya penaber di nav de ne tenê jibo siyaseta nemirovahî ya tirsê ye û kocberan bi rengekî xirab didin naskirin. Ev kiriyarên ku partiya ku xwe çep dide naskirin. Schily simbola dewleta polisa ye, ya nifretê ye. Ruyê Elmaniya ya rast nişan dike. Hevkariya wî bi Beckstein re li ser qanûnê antîterorê piştî 11 eylolê ji bo ku ne elmanan têxe qalibê terorîstan, ev raman dikeve rêza dûmkirina nejadperestiyê li Elmaniya.
Qedexekirina rojnameya Ozgur politîka dibe nimûneyek nû ji bo şidetê û curmkariyê û êrîşkirin li dijî komên kocberan. Ew li Tirkî û li Elmaniya bûne armancên hêzên paşverû.
Schily wezîrê karê hundur dixwaze wisa dengê rastefikran ji bo hilbijartinê gur bike. Ji ber Piranî kurd îro di bin xetera şandinê de ne.
Piratîka şandinê ya bi xetera mirinê di konferensa wezîrên karên hundur de hate tesbîtkirin. Elmaniya li tevahiya Ewropa rolekî girîng û pêşkêşî di warê plankirna komkirna şandinê de û di qampên penaberan li sînorên Ewropa de dilîze.
Hereketên van partiyên siyasî li Elmaniya pirin ku mirov nikare wan bihejmêre û negereke jî..
18 eylolê xwestekeke ku ev partî ne tenê têk biçin lê bêtir ku bê wate bimînin..
irtî şansê me heye dijî vê hikumdariyê derkevin.
Bi karên xêrê ji bo komên biçûk em razî nabin û em derfetê jî nadin. Em tenê wê demê xweşbext in, dema ku hemû bi hev re vê bêjn:

- **Dawîlêkirina rewşa jiyanek bê rûmet li Almaniya**
- **Dawîlêkirina qanûnên awarteyî, nijadperestî û şandinê!**
- **Rûniştin ji bo herkesî –anha û derhal!**
- **Stop Abschiebung bê şert û merc**

Acenda me: bi hev re berxwedan ji bo mafên wekhevî!!